## TEDBÎRA PÊŞÎLÊGIRTINÊ YA JI BER TEVGERÊN NEMAQÛL

Qanûnên Dakotaya Bakur rê didin hindê, heke di navbera du kesan de têkiliyek tune be jî mexdûr dikare ji ber tevgerên nemaqûl yên kesekî li alîkariyê bigere.

Reftar, gotin û tevgerên nexwestî yên armanc dikin li ser kesê din bandoreke xirab çêkin tevgerên nemaqûl in. Bandoreke bizirar tê wateya zirardana ewlehî yan nihêniya kesekî. Lê belê, protesto ku mafekî destûrî ye ne di nav vê de ye. Ji vê fermanê re dibêjin Tedbîra Pêşîlêgirtinê ya ji ber Tevgerên Nemaqûl (DCRO). Ev ferman ji kesê din re dibêje ku hin tiştên wekî têkilîdanîna bi mexdûr re neke.

Ji mexdûra/ê ku daxwaza DCRO dike re Daxwazkar yan jî Aliyê Parastî tê gotin. Ji kesa/ê ku ferman li dijî wê/wî ye re Bersivdêr yan jî Aliyê Astengkirî tê gotin.

Heke dadgeh xwedî bingehên maqûl be ku Bersivdêr tevgeên nemaqûl kirine, dikare beriya danişîneke tam DCRO'yeke demkî ragihîne.  Ev DCRO'ya ji bo Bersivdêr tê ragihndin ferman dide ku Bersivdêr raweste û bi mexdûr re têkiliyê daneyne. Wateya "Hat teblîxkirin" ev e ku temenmezineke/î ne beşeke dozê ye, bi gelemperî cîgirê Şerîf, kopiyeke DCRO'yê dide Bersivdêr.

14 rojan piştî teblîxkirina DCRO'ya demkî dê danişîneke tam bê pêknîn. Ji bo mexdûr DCRO'yekê bistîne, divê dadgeh bingehên maqûl bibîne ku bawer bike Bersivdêr tevgerên nemaqûl yên wekî reftar, gotin yan tevgerên nexwestî yên armanc dikin li ser Daxwazkar bandoreke xirab çêkin, kiriye.

Heke dadgeh DCRO'yekê ragihîne, ferman dê ji bo Bersivdêr bê ragihandin, heke ew li gorî fermanê tev negere ew ê bêyî agahdarkirinê bê girtin. DCRO dikare herî zêde ji bo du salan bê dayîn, lê wekî Fermana Parastina ji Tundiya Navmalî çek jê nayên standin.

North Dakota Century Code Chapter 12.1-31.2

Legal Self Help Form



North Dakota Domestic & Sexual Violence Coalition

Projeyeke ji aliyê NDDSVC ve ji bo we hatiye pêşkêşkirin - Gulan 2020